BÎR Û BAWERIYÊN KEVIN DI NAV GELÊ KURD DE

Beyar Bavî

Rabûna ava Xabûrî û qurbanî:

Heta ev an salên dûmahiyê jî, baweriyek hebû ku demê ava Xabûrê radibe, bi taybet li werzê biharê weku nimnimekê jê tê! dibêjin hingê ewî xwîn divê anku qurbanekê divê. Hindek dibêjin, pêşînên me demê ev tişte çê dibû hindek mirîşk ser jê dikirin û bi xwîn ve diavêtin Xabûrî de, da ku av damire!.

Pîremêrekê Zaxoyî dibêje: Çi Ji berî vî wextî anku li demê bab û bapîran, gava ev tişte rû daba (avrabûn) da hespekê bi rêk û pêkî û ciwan dixemlandin û da înine hindav Xabûrî û da avêjnê, dîsa da ku av damire.

Ev her du nîmune peywendiyekê di gel serhatiya avakirina pira Delalê û kujtina Delal ê bo me diyar dike ku ev diyardeye gelek kevn e û bo berî Îslamê vedigere (ev gotine bi gengê duwê min ji mamosta Sedîq Seîd wergirtiye, xelkê Zaxo ye û jiyê wî nîzîkî 60 salan e.)

Êşa pezî … û xemilandina jinkan bi cilkên zelaman.

Demê êş û nexweşî kevtibuwa nav pezê gund û metirsiya mirina pezî zêde bûba, bo çareseriyê, çend jinkên gund xwe bi cilkên zelaman radipaçan û da rext û tivengan girê din û da ser pezî de girin, da dest û pên şivanî girê din û tivengan ser pezî re avêjin û dû de kevin heta ku pez di ser avekê re derbaz bûba. Piştî hingê da ên dest û pên şivanî vekin, da xwe bo diyar kin ku merem pê rizgarkirina pezî ye ji evê êşê û nesaxiyê.

Demê pez tête beranî û bi ber dikevet anku li qûnaxa terş bi zik dikeve, dê keçek biçûk înin û deynin ser pişta beranî yan nêrî û di nîva pezî re înin û bin da ku berê pezê wan, mê be.

Lewleba meşkê û hestûkê marî.

Jinan dema meşk bi kar diîna, da hestûkê marî bi lewleba meşkê ve kin. Çiku digotin, bi vî rengî meşk wê rûnî bide û kef serbikeve.

Lewleba darê meşkê û dar bi ber, ev dare divê ji dareke bi ber be ne ku dareke bê ber û xirş be. Çinku digotin heger ew dare ji dareke bi ber be dê pezê wan jî zêde be û bi xêr û bêr be. Her wesa, rûnê meşkê jî. (ev çar gotinên li serî li devera Berwariya û deverên dî hebûn.)

Pişîk û kehîbûn; Demê mirov bi vê pîşîka mirovî kehî be û ji mal dernekeve, dibêjin divê mirov bengekê bîne û kurya wê pişîkê pê bipîve (anku hindî kurya pişîkê) û ewî bengî bi serderê xanî vek, hingê ew pişîk dê kehî bit û malê nahêle.

Çêkirina avahiyekê berê êkê; Dibêjin demê hostayekê bo êkê avahiyek ava kirî ba, da berê êkê rakit û deynit bo çendîn cara heta ku xwedanê avahî diyariyek dabayê da ji nû ewî berî deynit li bintara xanî . Ew diyariye ji pitiriya caran kalik û gorebîn.

Eve jî helbet wê çendê diyar dike ku her avahiyek yan avakirinekê diviya tiştek bo bête pêşkêşkirin heta xwe bigirit.